

Agahdarî û rêwerzên li weliyan di bûyera piştrastkirî ya covid-19 li pêşdibistanê de

Çima ez vê agahdariyê digirim?

Bi beşa / koma karmendên li pêşdibistana zarokê we girêdayî, bûyerên covid-19 hatine dîtin. Şopandina enfeksiyonê berdewam e û biryara derbarê berfirehiya şopandina enfeksiyonê şopînerên enfeksiyonê didin. Zarokê we wekî têkiliyek nêz nehatiye teşxîskirin û weke kesekî ku rasterast bi enfeksiyonê re rû bi rû maye nayê dîtin.

Testkirina ji bo her cara sermagirtinê dikare nerehetiyê bide zarokên biçûk. Ji ber vê yekê, tê pêşniyar kirin ku zarokên di temenê pêşdibistanê de di serî de bêyî testkirina covid-19 li malê bimînin.

Ma ez niha çi bikim?

Zarokên bê semptom dikarin çûndina pêşdibistanê berdewam bikin. Heger semptom hebin, yê sivik bin jî, divê ew biçin malê.

Heger hewceyîya we bi şewirmendiya bijîşkî hebe, bi 1177 yan bi navenda tenduristiyê ya rêkûpêk re têkiliyê daynin.

Divê zarok kengê li malê bimîne?

Zarokên bi semptom divê li malê bimînin û têkiliyên nêz bi kesên din re daneynin.

Di rewşa **semptomên demkurt** de: heya ku semptomên zarok hebin +2 rojên din jî li malê bimînin.

Di rewşa **semptomên sivik ên domdar** de (mînakî kuxika sivik û zekem): piştî ku li cem zarokê semptom peyda bûn bi kêmasî 7 rojan li malê bimînin, ji vana du roj divê bê ta (agir) û bi başbûnek gelemperî be.

Di rewşên ku test têne girtin:

Dema encama testê negatîf be:

Vegerîna li pêşdibistan an çalakiyên din dikare pêk were, dema ku rewşa giştî ya zarokê rê dide û li gorî rêgezên gelemperî yê derbarê rutînên nexweşiyê yê ji bo her çalakiyê de.

Dema encama testê pozîtîf be:

Divê zarok piştî xelasbûna ji tayê û başbûna gelemperî herî kê 2 rojan li male bimîne, û ji roja çêbûna semptomên û pê ve jî bi kêmasî 7 roj.

Telefon
0480-840 00

Fax
Bankgiro

8
3
3
-
3
0
0
7

Di rewşên ku di zarok de semptomên sivik ên bermayî hene, wekî kuxika zûwa û zekema sivik, ger 7 roj di ser nexweşiyê re derbas bûn, zarok dikare vegere pêşdibistanê û çalakiyên din.

Tecrîdkirina têkiliyên li malê kengî pêwîst dibe?

Biryara tecrîda li malê ji aliyê doktorek ve tê dayîn û tenê dema li malê nexweşek ji covid-19 yê piştrastkirî hebe tê pêk anîn.

Rastiyên li derbarê covid-19 de

Dema înkubasyonê çiqas dirêj e?

Dema navbera girtina enfeksiyonê hetanî di dawiyê de nexweş bibî (dema înkubasyonê) di navbera 2 û 14 rojan de ye, ya herî normal 5 roj e.

Semptomên normal yên covid-19 çi ne?

Bi gelemperî semptomên covid-19 yên zarok digirin ji yên mezinan siviktir in. Ew di heman astê de bi giranî nexweş nakevin û dibe ku bi qasî mezinan têger nebin.

Her wekî li cem mezinina ta (agir) û zehmetiya girtina nefesê semptomên herî normal in. Semptomên li cem hûn zarokan wekî zikçûn, vereşîn, westandin û rijîna çilmê hatine vegotin.

Coronavîrûs çawa tê digere (belav dibe)?

Coronavîrûs bi rêya enfeksiyona dilop û têkiliyê tê digere. Dema ku mirovek dipişkîne, dikuxe an diaxive, dilopên enfeksiyonê li hewayê çêdibe. Heger hûn nêzîkê wî kesê bin, hûn dikarin vîrûs vegirin. Dema ku dilop ketin ser rûber an tiştan, bi gelemperî bi rêya destan ev enfeksiyon ji wir belav dibe. Heger bêyî destên xwe bişon tilî têxin çav û pozê xwe, vîrûs dikarin bi vî rengî bikevin nav laş. Ji ber vê yekê girîng e ku hûn mesafeya xwe biparêzin û destên xwe timûtim bişon.